

Encama têkçûnên trauma û Libinguhêhevketina dûv traumayê re

Sedem – Encam – Alîkarî



Rêbera bi gelek zîmanan bo koçber û penaberan



Das Gesundheitsprojekt
Mit Migranten
für Migranten

MiMi

**Ethno-
Medizinisches
Zentrum e.V.**



**Traumafolgestörungen und
Posttraumatische Belastungsstörung (PTBS)
Ursachen – Folgen – Hilfen
Mehrsprachiger Wegweiser
für Migranten/-innen und Flüchtlinge**

Auftraggeber:

Niedersächsisches Ministerium für Soziales,
Gesundheit und Gleichstellung
Hinrich-Wilhelm-Kopf-Platz 2, 30159 Hannover
www.ms.niedersachsen.de

Herausgeber, Konzeption, Inhalt und Erstellung:

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Königstraße 6
30175 Hannover

Redaktion:

David Brinkmann, Ahmet Kimil, Nadine Norton-Erichsen

Layout und Satz: eindruck.net

Übersetzung:

Dolmetscherdienst – Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Bildquellen: Fotolia ©

Wenn in diesem Wegweiser Personengruppen benannt sind, wird im Folgenden vorwiegend die männliche Schreibweise verwendet. Es sind aber alle Geschlechter gleichermaßen gemeint. Dies geschieht aus Gründen des besseren Leseflusses und ist nicht als diskriminierend zu verstehen.

Alle Rechte vorbehalten. Das Werk ist urheberrechtlich geschützt. Jede Verwendung in anderen als den gesetzlich zugelassenen Fällen bedarf deshalb der vorherigen schriftlichen Genehmigung durch die Herausgeber.

Dieser Wegweiser ist in folgenden Sprachen erhältlich: Deutsch, Arabisch, Englisch, Kurdisch

Stand: Oktober 2015 (1. Auflage)

Peyva Bixêrhatinê

Xwendevanên rêzdar,

Carnan mirov di serpêhatiya jiyana xwe de, pêrgî wisa rûdanên metirsîdar û bitirs dibin, ku êdî tûşî nexweşiyên derûnî bibin. Rûdanên, ku jiyana mirovan dixin bin metirsiyê de, dikarin kartêkirinekê li jiyana mirovî bikin û di rêya kartêkirinê re dikarin nexweşî peyda bibin, ku êdî rojane tasîreke neyêne li ser jiyana mirovî biket.

Ev rêbera li ber te, dixwaze agahiyên li ser wan nexweşiyên, yê ji wan re bi giştî dibêjin „Encama têkçûna Trauma” û bi taybetî „Libinguhêhevketina dût Traumayê re” (PTBS) bide. Zêdebarî wê jî pêdiviyê rêkê bo pirsirina dermankirin, piştgirî û imkanên şewirwergirtinê, nîşanê bide.

Bo me gelekî giring e, em bikaribin tirsê ji hinavê wan mirovên bi van nexweşiyên ketine, jê bibin, û wan han bidin alîkariyê bipejirînin. Em dixwazin çareyekê bo we û kesûkarên we nîşanê bidin, çawa mirov dikare berwextê kêşeyên xwe yê tendurustî binase.

Gelek mirov hene. Yê paşxaneya wan koçber in, di nav civaka me de dijîn. Ev pirtûkok taybetî bo wê koma mirovan e, (lê ne bo wan bitinê), ji ber ew in yê zor têkildar in. Jimara wan mirovên koçber bûyî û niha li nav me ne, ku di rêka Elmaniya de, qewmînen zor bi tirs û êş dîtine, Trauma (sedema derûnî) bi wan re çêbûye û li vir bilezgirî pêdivî derman û tedawîkirineke û alîkariyê kartêker in.

Ez hêvîdar im, ku ev pirtûkok, ev rêber, bo wan mirovên têkildarî van core nexweşiyên û xizm û kes û karên wan alîkar be, û ji vî cihî, ez spasîyên xwe pêşkêşî hemî mirovên keda wan ketiyê di nav amadekirina wê pirtûkoka rêber de.



Di gelê rêzê min Ramazan Salman

Rêvebirê Navenda nojdarî ya neteweyan/rêvebirê giştî yê projektê tendurustiyê - MiMi

Naverok

Pê gotin	5
1. Trauma çi ye?	6
2. Ecamên têkçûna traumayê?	8
3. Libinguhêhevketina dîv traumayê çi ye?	10
4. Li kû alîkarî dibe?	14
5. Çawa Libinguhêhevketina dîv traumayê tedawî dibe?.....	16
6. Çawa dost û xizim dikarin alîkariyê bikin?	21
Ferhengok	22
Navnî an	26

Pêşgotin

Rûdanek, jiyana û dîtina coreyekî ji tudûtûjîyê, êrîşên saxsî an jî nexweşiyên gelekî zor û metirsîdar, nimûne ne û dikarin bibin sedema êxistina mirovan di bin barê tengasiyeke yekcar zor de.

Gelek mirov hene, yê buyar û rûdanên wisa an jî nêzîkî wan dîtina û bi serê wan hatiye, êdî di pey re di jiyana xwe de, derd û xeman gelekî dikêşe. Ji ber van serpêhatîyan mirov hêminî û tenahiye wînda dike û demeke dirêj pê divêt, tanî ew bawerî bêteavakirin. Eger bawerî nevegeriya êdî encamên pey trauma xwe didin der. Ev dikare xwe bi gelek şewênşanan derbixe mîna *Bêhêvîbûnê, tirs û têkçûna bi çinixê an gilîhên derûnî*. Eger hat û nehate dermankirin an jî biderengî lê hat pirsîn, dikare pirsgirêk zortir bibe. Hindek ji mirov ên ku dikevin vê rewşê ji nexweşiyê, herdem di nav buyarê de dijîn, xewnên nexweş dibînin û weke filmekî rûdan tene ber çav ên wan, tê wê wateyê, ku herdem , ew mirov ê têkeldarê wan rûdan ên derûnêş bi şeweyê wêne, deng û hestan dijî. Di rewşê ên rojane yê jiyane de, ew bîrhatin yê wan trauman dîsa radikin (dibine handan, bo têbîrkirina buyaran), dikarin bibin encam, ji barekî derûnî tund re mîna Stressê û bi reaksiyonên Psychosomatîk (laş û derûn) ve bihêne bestin bo nimûne mîna azar, dilxelênek, gêjbûn t.b.d. xwe der bikin.

Ew mirov êdî dixwaze xwe dûrî wan deveran bike, yê mirov, hizir an jî deveran, ku bûne sedema trauma li nik wî, tînin bîra wî. Ku dibin sedema rakirina wan hestan û kartêkirineke negatîv û berdewan li ser hestên wî dikin. Ev nişan xwe bi şeweyê Têkçûnê pey Trauma re, ku em wan wek bi inglîzî Post-traumatic stress disorder û bi kurdî *libinguhêketina dûv Traumayê re*, bi nav dikin. Li nik wan mirov ên koçber yê serpêhatiyê şer û cengan hene û kirine (mîna îşkencê û gelek şeweyên tund

û tujiyê dîtine), tete texmînkirinê, ku ji rêjeya ji 40–50% bi Post-traumatic stress disorder pê nexweş in. Di vî biwarî de, hingî kartêkirineke xerab li jiyana mirovê nexweş dibe, ku êdî nema dikare jiyana normal birê ve bibe. Êdî ew mirov hêdî hêdî xwe ji kes û karê û civaka xwe dûr dikin û xwe vedikêşin. Hindek ji wan mirovan, dixwazin vî derdê xwe bi rêka alkoholê û vexwarinê an jî dermanan xwe hoşbir bikin.

Di dema rûdanê metirsîdar de, mesela wî dibe hebûn û nebûn, tirs peyda dibe, kontrolê wînda dike û gumaneke mezin li def peyda dibe. Ji ber wisa jî, kes ên trauma bi wan re, di pey rûdanan re xwe bêhêvî dibînin dikevin bin barê tirseke mezin de û zewqa wan têk diçe.

Tu bi çi şeweyî ne dînî „şêt“, lê tu nikarî digel wê zehmetî û tîrsa te dîtî serederiyê bikî. Gelek caran, xizm û kesûkarên te û hevalên te, nizanin çi bo te bikin, dema te û wan guhertinên çêdibin, xem ên bo te peyda dibin. Ew jî di vê rewşê de, bo te gelek xemgîn dibin.

Ev rêbera ji bo xwebi peyvanekê nêzîkî yê nexweş û kesûkarên wî dike. Ev pirtûkoka rêber, şirove dike, ka Traumata çi ne û Têkçûnê li pey rûdanan çi ne, çawa xwe diyar dikin û çawa dikarin çareser bibin. Ev fehres adrêsan, hemî cihên pêvedîdar yê giring rêz dike.

Ev nivîs ên xwar (Kursiv), dê di ferhengokê de, bêhtir bêne ravekirin.

1. Trauma Çiye?

Ev têgeh "Trauma", (Pirbûna wê, Traumata ye), bi xwe peyveke yewnanî kevnar e û wê wateyê dide „Birîndarkirin“, an jî „birîn“. Birîndarkirin, dikare ji birîndarkirina laş re bête gotin, her wesa dikare ji ya derûnê re jî bête gotin. Ev pirtûkok tenê xwe bi têgeha Birîndarkirina giyanî, derûnî ve bisinor û çarçew dike.

Mirov ji Trauma diaxive, dema ji nişka ve û yekem carê be, dubare bibe an jî kartêkirina xerab î demdirêj be, ji buyereke giran û birîneke derûnî kûr li pey xwe bihêle. Nişana trauma ya herî diyar eve, dema her mirovekî nêzik guman li def peyda bibe, û yekrast pê hest bike, ku metirsiyeke mezin dikare bigihe wî û jiyana xwe, wî û jiyana hin mirov ên din, têk bide.

Cureyên Traumata

Di nojdarîyê de, cudabûnê dixin navbera cureyên Trauma de. Ev cudabûna ku dikeve navbeyna wan de dikare zor giring bibe û bibe destnîşankirineke rast bo dermankirinê. Weha caran buyer ên yekcar an jî demvekêş hene, bo nimûne Rûdanên metirsîdar û yekcar tecawizkirin. Dema ku ev dubare bibin, dikarin demeke dirêj kartêker bin. Nimûne bo wê hindê, hene, mîna dema mirov dîl tê girtin û işkence lê dibe, an jî bo demeke dûr û dirêj tade û tecawiza seksî lê dibe.

Mirov ên, ku di vî biwarî de, pispor in, Traumata yên dikin du beş "Traumata ku bi sedema mirovan çedibe û ya „ku mirov nedema peydabûna wê ne“. Traumata yên ku bi sedema mirovan peyda bûye, wate mirovan kiriye, gelekî zor in û encam ên wê yên xerab hene. Dema mirovekê yê din birîndar bike, işkece bike, serederiyeke xerab digel bike, dikare bibe sedema ku êdî ew mirov qet bawerîya wî bi mirovên bigiştî neyê û ew bawerîya heyî nemîne (Bêbawerî), ji ber nayête çavlêkirin, ku mirov wisa van kar ên nebaş li dijî mirovî bike. Susretek û kambaxkirineke suruştî an jî bibelerzek dikare mirov bixe nav nav ûmoranê û derûna wî nesax bike, lê serederiya digel van cureyan ji Trauma, cuda ye, ji wê Trauma ya ku bi sedema sedema mirovan derûna mirovî nesax diket.



Ew wêne nişan dide, ka kijan rûdan bi kijan kategoriyê ve bende:

Traumata yên bi sedema mirovan peyda dibin

Ceng, işkenc e û dilgirtin

Bikarînan seksî nerast, tecawiz û tada cinsî

Tundû tîjiya li diji laş

Tade û tecawiza beramber zarokan

Piştguhkirina zarokan

Traumata yên ne bisedemên Mirovan

**(Rûdanên çûnûhatinê-/qezayên kar)
Rûdan = Qeza**

Rûdanên suruşti (bibelerz, lehî û Volkan)

Nexweşiyên zor/ emeliyat

Mirina ji nişka ve, ya mirovekî nêzik

Ne her Trauma yek, bi automatîkî dikare bête veguhestin bo nexweşiyê derûnî û neher mirovekî ku serpêhatiyên wî derûnî hebîtin, bi pêş de diçe û encam ên li dûv Trauma peyda dibin û têk diçe bo nimûne Libinguhêhevketinek pey Trauma (ku wê dikapîtel a 3yan de şirove bibe). Gelek mirov, yê mecbûr bûn wisa serpêhatiyên kambax bibînin, hêdî hêdî bêt ku nexweş bikevin, xwe nişanên wê azad dikin. Lê hinek mirov ên din hene, nikarin. Bi giştî em dibêjin, ku hêza mirov heye, xwe ji encamên van rûdan metirsîdar bi şeweyekî xelas bike.

Zor fekter hene, dikarin bi rolekî rabin. Hinek ji van fektran, dê di dersa din de, bête ser axaftin.

2. Encama têkçûnên trauma çi ye?

Mirov ên ku buyer ên Trauma yên metirsîdar jiyay bikin, dikare Têkçûnên derûnî- Encama têkçûnên derûnî- bi wan re çêbibe an jî ew nexweşiyên derûnî yên lê heyî bêhtir û bihêztir bibin.

Encama têkçûnên Traumayê dikarin bi gelek şêweyan rû bidin. Ev encam ên jêrîn rû didin

- Zîrar di baweriyên kevin de û bigîştî bawerî êdî qet bi mirovê li hember neyête anîn.
- Zîrar di baweriyên kevin de û bigîştî bawerî êdî qet bi mirovê li hember neyête anîn.
- Jîdestdana nirxan, baweriyên û nêrînan
- Hestpêkirina bi şerim û guhnekariyê
- Metirsiya mezin
- Hest bi xemgîniyeke kûr û nekarîbûna karî
- Hest bi bêhêvîtiyê û bêserûberiyê
- Xwedûrkirina ji civakê
- Hest, ku cuda û şête
- Bê atîfe
- Fikra xwekuştinê
- Yên tecawiza cisî li wan hatibe kirin; windakirin kesayetiya mêbûn an jî nêrbûnê
- Nexewkrin/ hilçenîna ji xewê/ zû jixewrabûn
- Têkçûna Ponijîné(Tîrbûnê)
- Alkohol û an jî/ kişandîna û birina regez en hoşber

Gazîne gewde û nexweşî (yên derûnî)

Hinek mirov hene- bitaybet ew yê qurbanî tund û tujiya laş dibin- piştî rûdanên dibin encama trauma, êş û azariyê laşî li nik wan peyda dibe bo nimûne (serêşa zêde û zor) an jî nexweş dikevin. Eger ji encama tadeya li gijanê mirovî, kartêkirin li laşê wî bibe, jê re dibêjin Psycho-Somatîk. Di gelek caran de, li dor van kartêkirinan hijmara mezin, ji mirovên têkildar sedemê van encaman jê re nediya in. Babeta li pey vê ku were pêdivî ye, nêrîneke gîştî, kurt û agahiyan li dor nexweşiyên, ku dikarin çêbibin bide, yê dikarin bibin Encama Têkçûnên Pey Trauma

Têkçûnên Derûnî

• *Depersiyon (Bêzari)*

• *Têkçûnên bi Tîrsê*

• *Têkçûnên gijanî*

• *Libinguhêhevketinek pey Trauma*

• *Têkçûna çêja xwarinê (xerabûna şehiyeta xwarin)*

Êş ên gewdeyî (Psychosomatik)

• *Migrêne (serêş= şeşîqa)*

• *Ilthaba gede (Qerha Midê)*

• *Nexweşiyên Malzarokê*

• *Astma (bêhinçikîn= Rebû)*

• *Têkçûnên cînsî(seksî)*

Faktorên kartêkirinê

Fekter ên cuda hene, dikarin kartêkirineke bihêz li Encama têkçûnên di pey Trauma re bikin: jibîlî wê, temên mirovê têkildar û biserhatinên wî yê jiyane roleke mezin dilîzin. Lê tişta herî girîng ew e rewş û şêweyê jiyana piştî serpêhatiyên Trauma re, bo nimûne, aya ew alîkarî û piştgiriye ji xizim û kesûkarê xwe distîne, dor û ber tenahî heye an nîne.

Kartêkirineke nerênî dikare bibe, bo nimûne, , ku alîkarî û piştgiri ya hinek mirovan ku dikarin bête birrîn, an jî yê nexweş hest li nik wî peyda bibe, ku kesayetiya wî piştî vê nexweşiya ji hêla derdorên xwe ve, bi çavekî biçûk lê tete nêrîn. Rewşên din hene, mîna netêkilbûna digel mirovan û dûrbûn ji wan yê pêbawer, kêşeyên zimên, dûrbûna ji civakê an jî niştêcihbûna nemisoger, dikarin bibin sedema ku Trauma zû an jî ji kok ve bêyî alîkariyeke pisporane û perefisyonel hêdî saxlem bibe an jî qet rihet nebe. Ev Post-traumatic stress disorder û bi kurdî libinnguhêhevketina dûv Traumayê re, dikare bibe durvekî taybet ji Encama têkçûnên derûnî. Zorê caran Encama têkçûnên derûnî yê giran, dikarin bibin beşekî taybet û bihûrbînî bêne şirovekirin.



3. Libinguhêhevketina dûv Traumayê re, çi ye? Post-traumatic stress disorder

Ev kîteya Post ji latîni têt û wateya wê bi kurdî hemen hemen (Pey= li dûv) tê. Ev weke hemî wateyên din Encama têkçûnên Traumayê, ku heyî, xala sereke têkçûn e, ya di rêka ya jî ji encama serpêhatiyên derûnî, giyani xerab hatibin.

Cure û Nîşan ên Libinguhêhevketina dûv Traumayê re, çi ye

Tîştê diyar e, ku nîşan ên PTBS di hundurê sê mehan de, didine der di pey serpêhatî û serboriyên xemnakî. Ev kêşe û pirsgirêk dikarin di hundurê mehekê de, winda bibin, mirov navekî ji vê rewşê re datîne, ew jî ev e têkçûna barê derûnî yê bilezginî, ev jî Libinguhêhevketina pey Trauma yê re, cuda ye, ji ber dema wê kurtir, ewê jî pêdiviya bidermankirina demdirêj nabe, Eger hat azar û êş û gileh zêde bûn, êdî dibe nîşanek ji nîşanên Libinguhêhevketina di pey Trauma (Xemnakî) yê re,

Ev Symtom (diyarde), ne hertimmî nîşana Libinguhêhevketina di pey Trauma re ne: Hindek mirov hene, piştî rûdanên xemnakîyê bi demeke kurt azarên wan rûdidin, hinek çend mehan dûv re dirêj dike û hinek mirov hene piştî rûdanên xemnakî bi gelek salan derkevin û Trauma wan zêde dibe. (piştî şeş mehan, mirov dikare bibêje eve Libinguhêhevketina piştî Trauma re ye, ku hinekî giro bû). Carnan zor e, mirov bibêje ku ev nexweşî encama rûdanên xemnakî ne. Ji ber wê yekê jî, naskirina wan cureyên nexweşîyan di rêka fehs û tecrubekirinê re jî ne her car hêsan e. Jibilî wê jî, ew mirov ê nesax, naxwaze wan rûdanan bîne bîra xwe û dixwaze xwe dûrî behsa wan

rûdanên xemgiran yên pê re çêbûyî bike, ku êdî yê tedawîker piştî demek û danûstandineke dirêj qûnaxekê vedike, bo avakirina pira baweriyê, wê bizanibe jiyaneke nexweş li dûv e. Ji ber wê yekê jî têkiliyek bihêz di navbera yê nexweş û tedawîker gelekî tete xwestin, daku bikaribin, sinorên şermê têper bikin û li ser wan babetên zor biaxivin û pêkve li ser wan kar bikin.

Çendî destnîşankirin ne bi sanahî jî be, lê hindek nîşan hene, dikarin bibin alîkar bo nasîn PTBS. Eger hat hinek nîşanên wekî li jêr bîn bi te re an jî bi hinek ji kes û xizmên te re çêbûn, ev dikare bibe nîşana biketina wê nexweşiyê.

➔ Dubarejyankirin

Mirov ên di kewdanên xemnakî û trauma de, bi gelek cureyan û hemereng dubare dijîn. Wisa bîrahatinên xerab û nexweş ji rûdanan der dibin, bêyî ku mirov bi xwe wan bîne bîra xwe (Intrision). Gelek caran ew mirov ên xemnak in, kabûsan „şevpestan“ encama wan rûdanan dibînin. Gelek caran, şelîta bîranîne bi paş de vedigere. Ev têt wê wateyê, ku mirov rûbirû bi wan buyaran re dibe û mîna filmekî tene ber çav. Mirovê bi trauma parçeyên taybet ji wan rûdanan dijîn û mîna wêneyên zindî di ber çav ên wan re derbas dibin, xujxuj û hestkirin. Hinek nîşanên rûdanê yên derveyî rûdanên Trauma tînin ber çav mîna Bêhin (ya sotanê, Bezîne, xwêdanê etc.) dangan (bo nimune dengê fişekan, lêdana deryan..), hesta tete çavdêrikirinê û hin hest ên din, bîranînên tehel, dikarin bibin sedem bo stresê û hindek reaksiyonên laş yên din.

➔ Rev ji rastiyê

Gelek mirov hene, ji tirsê ji hestên negatîv û metirsiyan pêkolê dikin ji komên mirovan birevin, têkîla xelkê nekin, xwe ji hemî tiştên, ku rûdana bûyesedema Trauma dûr dikin, naxwazin bibin bira xwe. Di wê dema buyer bête bira wan, xwe di metirsiyê de dibînin, dibe ku pêdivî bi tirs nebe jî. Ew mirov dixwaze xwe ji hemî birahtin, hestan yê rûdanê tînin bîrê dûr bike, ew mirov, axaftin, Cih an jî serederî, yê bi bûyera jiyayî û qewimî ve berband.

Metirsiya heyî, ku di dema dermankirinê de, bi şaşî, tenê symptom (nîşan) ên laş an jî nîşanên derûnî yê nesereke ji wan re bibin xal ên navend bingehîn û sedem ên navendî û serke bêne piştguhixistin, ew yê ku têkildar bizavê dike, wî alî veşêre, û li ser rewşa xwe û êşa derûnî neaxive. Dikare weha jî be, ku nexweş bixwe nikaribe xemên xwe bi Trauma ve girê bide, wate ev xwe ji babetê dûrxwin, ne bi mebest be pêk bihêt.

➔ Ramanên xerab, kêf û hest

Gelek guherînên negatîv peyda dibin, mîna „bawerî bi kesekî neyêt“ an jî hestên negatîv li def yê nexweş peyda bibin û bi gelek cureyan bin, tirs, Metirsî, acizbûn. Şermîni an jî xwe gunehkar dîtin. Xwe xerîb dibînin ji yê berê biwanbawer û xwe ji zewiyê komelgeha xwe vedikêşin. Dema herî gelek xemgînin, mukûsdayî ne û gelekî reşbînin beramber paşeroj û dahatûyê. Ev xemnakî weha li mirovê têkildar dike, ku êdî bibe mirovekî hestsar û hin bi hin ew hest û hêla erênî li ba wî hebû winda bike. Ew hest û nestên erênî, bextewerî, xweşî û nazdarî hin bi hin winda dibin.

➔ Zêdehigingirandin

Em biçin koma din ji wan Symptomên (nîşan) yê Libinguhêhevketina li dût Traumayê PTBS, ku bi symptomên zêdehigingirandin têne hesêb ê. Ew mirovê têkildar her demî, wek ku li amadekariyê bin û ew hest li def wan peyda dibe, ku dibe nêzîk qewmînek xerab çêbibe. Ji ber wê yekê jî, ew mirov nikarin di rehetî û heminiyê de bijîn. Kêşeyên wan î razanê hene, ew nikarin zû di xew ve biçin û nikarin bi yekcarî xew bikin an jî spêdê zû hilo dibin û bi tiştên wan aciz dike, diponijîn. Reaksiyonên wan bi veciniqandin e û deng bi hêz ji wan re tê, mîna ku ceng be. Dikare ji ber tiştêkî netiştêk xwe gelek aciz bike, bihingire û şerrûdî bibe û kêşeyan li yê bermaber xwe derbixe, bo nimûne şer bi xizm û yê nêzîkî xwe re bike, an jî tiştan bişkîne, an jî serederiyekê bike, ku beriya Trauma li nik wî peyda bibe, nedikir. Ev hingirîna zêde û acizî kartêkirinê li tîrbûnbûn û ponijîna wî bike.



Nexweşiyên tevihev

Gelek mirov, yên ku bi nexweşiya libinguhêhevketina pey Traumayê re ketine, dikevin bin kartêkirina wan symptomên li jor behesbûyî û ji wan re navekî din jî tê gotin, „comorbid disorders“ Nexweşiyê neberhev ve“

→ Lihevketin- wate têkçûnên di rêya

Tirsê re

Ev dikare di rêya peydabûna sedeman re careke din were, ew yê Trauma pê re, dişan têtê hizra wî (di encama Sehewgirtinê ên tirsnak bê sedem jî dikarin peyda bibin). Ew mirov di wê kêlikê de, dikev bin encama tirseke bihêz de, bêyî ku sedemek bête dîtî. Êrîşên sehewgirtinê diyar dikin, ku reaksiyonên laş jî mîn sivikbûna lédana dil, xwêdangirtin, lerzîn, hestbûna bi nekarîna hilimkêşanê an jî fetisînê, azar û êş di sebeta sîngê de, dilxelênekbûn, gêjibûn, tagirtin (serma9, pêlên germbûnê, serlêgerînok, bêhestkirin, Tevzînok di laş de, di wê kêlika ku ew mirov tirseke mezin bikeve hinavê wî, di wê kêlika ew mirov hest bike, ku dîn bûye, wê bimire an jî wê kirîza dil pê re çêbibe.

→ Bêzarî

Gelek yê Trauma bi wanre hey xweşiya xwe bo hindêk tiştan winda dikin. Ku berê xweşî pê didîtin, tim xemgîn diyar dibin, û bêhêvî ne. Ev hizir û hest ên bêhêvîbûnê dikarin girantir û bihêztir bibin, ku bihêle yê bêhêvîbûnê pê re hebe, bi nema heza ji man û hebûna xwe bike an jî wilo bixwaze xwe ji vê jiyane xelas bike.

→ Vexwarina Alkohole û biakranîna şaş ya dermanê hoşber

Ji bo êş û azar ên xwe kêmkirina bike û wan wêneyên bitirs ji serê xwe bavêje an jî daku bikaribe bixewê, dest bi vexwarineke zor ji Alkoholê dike an jî dest bi birina regezê hoşber dike. Alkohol-, û regezên hoşber an jî bikaranîna bihele û şaş ya dermanan, dikarin bibin sedem, ku tedawî û dermankirina têtê xwestin kartêkirina xwe neke û di wê rê re, yekcar laş û giyan zîyanê bibînin. Kartêkirina derman her dem, tenê bo demeke kurt êşa giyan benc dike. Ev rewş ên wisa bixerabî derbas bûyî, pêdivî ye her dem bo nojdarî û tedawîkirinê bête got û li ser pê re bête axaftin, ta ku bikaribe çareseriyek bo wê bête dîtî.

➔ Têkçûnên din

Ew Libinguhêhevketina dûv traumayê, di gel piştgirî û alîkariya civakî, dikare bibe sedema ku yê nexweş xwe di tenêtiyê de bibîne. Ditirsin ku ew neyên fehemkirinê. Ew li her dem biguman in, herdem hest dikin, ku fenûfût li wan dibin, û di hindêk pergalan de, pirsgirêk hene, ku bikarin roja xwe birêkûpêkî bi ser de bibin. Nikarin xwe konsentre bikin, ev zêfbûn li kar, di dibistanê de û gelek tirs li nik wan peyda bibe ku xaniyê tarî bicih bihêlin. Li hêla din jî, piştî bi serhatiya wan rûdanên xemankî de, pirsgirêk û tirs peyda dibe, ku bitinê bin, ew nîşanên derûnî jî, di şeweyê wesasbûnê, an jî dînîtiyê diyar dibin, ev rewş pir kêr in, lê parçeyek ji libinguhêhevketina dûv Traumayê ne.

Rewşa li dûv Trauma tê

Bi her hal, gelekî giring û pêdivî ye, mirovên bi nexweşiyên derûnî alîkariyeke pisporane, bi lezgînî werbigirin, daku ew Têkçûnên encama nexweşiyê kembaxtir nebin û delîve bûn wan hîn hebe, ku bizivirine jiyana xwe ya normal. Eger hat û Symptom ên nexweşiya Libinguhêhevketina piştî Traumayê re, li nik te an jî ji hinek kes û xizmên te hate dîtin, divête di cihê ceh de û di demeke kurt de, xizmetguzariyek di rêka seredana bijîjk an jî tedawîker bête kirin! Wek li def her kesekê ku bi Ecama dûv Traumayê ketibe, nayê wê wateyê, ku buyereke xemnakî derbas kiribe, pêdiviya wî automatîkî bi Therapiyê heye.

Zarok ên bi Traumayê

Zarok jî mîna mezinan dikarin bi Encama têkçûnên pey Traumayê re bikevin an jî bi PTBS nexweş bikevin, eger ew jî rûdanên ku dibin sedema Trauma yê mîna Tecawizkirin, serpêhatiyên cengê, rûdanên suruştê yê kembax, windakirina mirovekî eziz û nêzik û t.b.d. bibînin. Zarok jî wê êş û xemankiyê wek mezinan hest dikin û kartêkirinê li perwerde û mezinbûna wan dike. Bi giştî, em, dikarin bibêjin, ku nîşanên nexweşiya Libinguhêhevketina li dûv Traumayê re „PTBS“ yê li nik zarokan diyar dibin, hinekî ji yê lo nik mezinan peyda dibin, cuda ne, lê bi giştî, nîşan û Symptom ên bingeîn nêzikî hev in. Dibe ji ber temenê wan yê biçûk, nikarîbin mîna mezin xwe bînin zimên û Symptom ên wan bi şeweyekî din dikarin bêne diyarkirin. Bo nimûne Zarok dikarin, xwe serdestî wê xemnakiya bi wan çebûyî, di rêka yariyan re, bo nimûne rûdana nexweş ya ku rûdayî wek yariyekê bête şanokirin. Hinek zarok hene, ku xwe ji civakê vedikêş in û dixwazin bitenê bimînin û naxwazin yariya an jî her çalakiyeke din bikin, ew bixwe gelek çalak in, lê zewqa wan têtê şikandin û gelekî ture dibin (dihingirin), an jî nîşana xweşiyê nema diyar dikin. Yê hinekî mezin, zehmetiya di dibistanê de dibînin, xweşiyê wînda dikin, bi dîtin û yarîkirina bi hevalan re an jî bigiştî zewqa wan nîne, ku di dema vala de bilîzin.

4. Li kû alîkarî tête wergirtin?

Ya gelekî giring, ku mirov bizanibe, ku her mirovek dikare bi nexweşiya encama têkçûna piştî westiyane bikeve. Li nik wan mirov ên bi vê nexweşiyê ketî, ji şermînî- hestê gunehkariyê, ku derbirin e, ew mirove nema dikare têkçûna derûnî ya xwe derbas bike, ew jî pêdivî dermankirineke professionell e, mîna nexweşiyên laş î.

Bi giştî. li Elmaniya, imkanên alîkariyê û şewirdanê yê zor baş, dema mirov bi nexweşiyên derûnî bikeve hene. Bi taybetî jî, serederiyên di gel traumayê (Tedawîkirina Traumayê) têne pêşkêşkirinê. Hemî gileh ên ji ber êşê, rêya wan ya fermî û rast bi iyada bijjîkê malê dikeve. Her yek li gorana nîşanên lê dertên û diyar dibin, têne hinartin bo bijjîkê pîspor an jî tedawîkerê derûnnas, wate, yekî, ku di rêka xwendinê re û bidawîna pişeyê xwe ye ku di wî biwarî de, fêr dibe, ku têkçûnên derûnî tedawî bike. Hun dikarin piştî dana soza jivanê û guftûgoya yekem jî direkt lê yekser jî bo yekî pîspor bête hunartin:

- Nojdariya derûnî
- Zanistiya Derûnî ya tedawîkerê derûnî
- Dermankerê derûnî yê zarokan
- Bijjîkê pîspor bo derûnê û tedawîkeriya derûnî
- Bijjîkê pîspor bo tendurustiya derûna laş û tedawîkeriya derûnî
- Bijjîkê pîspor bo zarok û nojdariya derûnî ya gencan.

Di ferhengoka ya vê pirtûkoka rênsiyê de, hemî ev têgeh bi hûrbîni yek bi yek bîna ravekirinê. Hemî pîsporê, hindêk asteyên zanistê di wan biwaran de, taybet fêrbûn bidawî anîne, bo wan alîkar e, pênasînekê diyar bikin û pêşniyar bikin, ku ka çawa tedawîkirin di gel te bête birêvebirinê.

Hindêk pîspor ên taybet bo tedawîkirina xemnakîyê hene. Jibîlî wê, ew hilgirê nîşaneke dinin, ku „tedawîya trauma derûnî“ ji wan re tê gotin.

Şewirwergirtin û gava yekem berbi tedawîkirinê

Bei der Suche nach einer für Sie geeigneten Behandlung helfen Ihnen zum Beispiel die Beratungsstellen der *sozialpsychiatrischen Dienste*. Auch ihr Hausarzt oder eine *Selbsthilfegruppe* können Ihnen dabei behilflich sein und gute Ratschläge geben. Darüber hinaus gibt es auch spezielle Internetseiten, auf denen Sie sich informieren können.

Serederî, di rewş ên aloz de

Di rewş ên Lezgîn de, ku tu an jî kes û xizm û karê te, hestên xwekuştinê bi hêz li def wî peyda bibin- an jî bixwaze bike, hun dikarin telefûna hewarhatinê bikin, li ser vê numerê 112!

Li geriya bo cihekî rast û baş bo tedawîkirin, hindek cih dikarin bi te re alîkar bin mîna dezgeha şêwirwergirtinê ya xizmetguzariya derûntedawîkeriya civakî. Bijîjkê te ya malê jî anj jî komên alîkariya xwebixwe dikarin bi te re alîkar bin û şîret ên baş li te bikin. Zêdebarî wê jî bi taybetî rûpelên Internêtê, ku tu bikaribî agahiyan werbiigirî.

Ji kerema xwe hay jê hebe, tu biçî nik bijîjkê malê. Bijîjkê pîspor an jî tedawîkerê derûnî, pêdivî ye karta xwe ya sîgorta nexweşiyê bi xwe re bibî! Hemî bijîjk, tedawîker û baregehên tedawîkeriyê, dikevin bi barê erkê agahneveguhestinê. Ev tê wê wateyê, ku nabe çi agahiyekê li dor te bo mirovekî din bête veguhestinê!

Eger hat û rewşa te gelekî têkbiçe û dichêceh de pêdivî alîkariyê bibî, tu dikarî jî berê xwe bidî vê cihê bi navê Derûndermakeriya Xizmetguzariya qeyranan. an jî yekser Kilînkuma Derûndermankeriye!

Ev agahiyên li dor li kû alîkariyê werbigirî. Dinkarî li beşê rênasa navnîşanan, di vê pirtûkokê de bibînî.

Ji bo mirov ên penaber, ji çareserkerinê, hindek rênmayên sisttir hene. Ji kerema xwe hayî ji agahiyên di sindoqê li jêr.

Agahiyên taybet bo penaberan

Ew penaber ên, ên ku eve kêmi 15 mehan li Elmaniya dijîn, nikarin bi sanahî bi şêweyekî yasayî misoger(Sîgorta) bibin, mafê wan li gor yasay penaberên hîn mafê manê wernegirtî (AsylbLG) heye.

Lê li beramberî wê jî, mirovên bi fermî sîgortekirî li nik her dezgeheke Sîgortayê, yê penaber ji bo çareserkerina kêşeyên tendurustiyê hindek xizmet ên bisinor hene. **Mafê alîkariya tendurustiyê ya êş û azariyên nexweşiyên gelekî bilez û azarên bilez**, mîna yên nexweşiyên kevnar = Kronîk, yê ku neyên demankirin û rewşa tendurustiyê kembatir bikin hene.

Bi giştî û li gorana yasayê nexweşiyên derûnî, weke nexweşiyên „bilez“ nayêne dîtinê, ji ber wê jî ne mecbûr in, serederiyê digel bikin û tedawî bikin. Mirov ên hîn kêseyê wan ya penaberiyê çareser nebûye, bigiştî „nikarin hêsan“ herin nik bijîjk î. Eger nexweşî hebe, li gor rêmayan dikarin yekem gav berê xwe bidin nivîsgeha civakî (Sozialamt). Li wir karmend, dibîne û dikare destnîşan bike, eger pêdivî heye. Eger hat wisa be, yê penaber belgeyekê ji yê karmend werdigire û bi wê belgê dikare biçe nik bijîjkekî.

Eger hat ew mirov 15 mehên wan li Elmaniya wek mirovên ku mafê penaberiyê xwestibin çêbûbe, an jî beriya we demê, ku mafê penaberiyê werbigire, hinga mafê wî heye, ku xizmetguzariyê werbigire li ser bingeha yasaya Pirtûka yasayî ya civakî (SGB). Ji wê demê û pêve, dikare bibe endamê sîgorteyêke yasayî. Eve rêya çûna nika terapiya derûnî di encamê de bisanahîtir dike, lê dîsan jî tu yasa mecbûr nake, ku bihayê dana wergervane te bête wergirtin. Ji kerema xwe, li parçeyê „Wergervan li Rûpela 20 binêre.

Li pirs ên û pêzanînen lezgin an jî şêwirwergirtinê hun dikarin berê xwe bidin b.n. (NTFN) Tora ji bo Penaberên Xemnakî bi wan re heyî. Hun ê navnîşanê di beşê navnîşanan de bibînin.

5. Çawa Libinguhêhevketina pey têkçûnên Xemnaki tete tedawîkirinê?

Ji bo tedawîkirina Libinguhêhevketina pey têkçûnên xemakî re û destnîşankirina rast ji şeweyê çareserîkirinê du tiş watedar û giring in, yek Trauma bixwe û rewş ên bi xwe re tîne.

Bi şeweykî giştî çareserîkirina Libinguhêhevketina pey têkçûnên xemakî re, di çarçêweya terapiya derûnî ye. Tişt nas gelek rûniştinê bo tedawîkirinê tene kirinê û di pey re, dibînin ka tedawî berdewam bibe. Çareseria Xemnaki" Trauma" li Elmaniya gelekî bi pêş ve çûye û encam û serketinên zor baş bi dest xwe ve anîne, û bi taybet, dema nexweşî berwext nas bibe, hinga tedawîkirin di çarçêweyan de misoger e. Armanca rêçûna terapiya xemnakîyê rasterast, herdem berbi bi şeweyekî taqekesane pêdivî û kêşeyên taybet yên wan mirovên t êkildar ve diçe.

Gelek rêgayên tedawîkirinên cuda yên derûnî hene, lê divêt bête gotin jî, ku di vê prosesê de, guftûgo karekî zor giring e. sê ji van rêgayan li Emaniya de jî sîgortayên fermî(yasayî) bêne pejirandin, wate hemî mesref û xercî wê bêne danê: Terapiya serederiyê (Silûk), tedawîya derûnî li ser bingeha tedawîya kûr û dînamîkî ya derûnî û Terapiya analîtîkiya derûnî.

Therapiya silûkî

Armanca ku tedawîkirina silûkî, giraniya xwe dideyne li ser guftûgoyê, rahênamê û nêrînên nû yên keşe û pirsgirêkên silûkî (bo nimûne gumaneke zêde zor an jî fikarên zor neyênî û negatîf), yên ku dibin sedem nexweşî bêne naskirinê, bêne guhertinê û ev dihêle serpêhatî digel van kewdanan çêbibin. Serederî digel û guhertina şeweyên têramandinê û temamkirin wate, Guherîn di gencîna „sawîran“ silûkî de, armancên sereke, bingeîn û giring in di armancên tedawîkirinê de, ku kêşeyên niha yên xala sereke û navend bin.

Therapiya derûnî ya kûr û dînamîkî

Ev şewê Therapî, weha ye, ku çalakiyên aqil yên zanayane û yên nezanayane yên derûnî kartêkirin li ser tendurustiya derûnî ya mirovan heye. Nêrineke tenê di silûkiyeteke aloz de û azarkêşiyê di rêka liserhoşîkirinê û ji kêşeyên neliserhoşiyê an jî Tecrûbeyên tene gemkirinê dibe bawerîyeke giring û xaleke palpêspartî, boçareserîkirina Têkçûnên derûnî.

Therapiya derûnî ya analîtî

(Ravekirin=şirovekirin)

Bi vî rengî ji Therapiyê, li gorana serpêhatiyên çêbûyî û dibin, digel wan kêşeyên ne ji serhoşiyê encam didin û karbûna bo saxlembûna wan xala bingehîn ya Therapiyê ye. Nêzîk weke li nik terapiya derûnî ya kûr û Dînamîkî jî behsê dermankirina bi guftûgo li dor serpêhatiyên, bo nexweş diyar bibe, ka çawa ew kêşeyên kevin bi yê nû re bargiraniyekê durust dikin û çawa pêk ve girêdayî ne. Di rêya naskirina vê bestina van kêşeyan bi hev re, imkan peyda dibe, ku mirov ji serpêhatiyên xwe yê kevin û buhurî sûdeyan werbigire û fêr bibe, bo nimûne, ew fekar û ramanên xerab û nerênî bêne guhertin û vê guherîne, bikin bingeh bo tedawîkirina xemnakiya (Trauma) heyî.

Therapiya li Nexweşxaneyê û ya li

Hawarhatinê

Imkan bi giştî heye, ku terapiyeye hawarhatin-î(lezginî) her heftiyekê, maweyî yek demhijmêrê bi rê ve biçe. Ev tê wateya, ew mirov ên têkildarî terapiyê, dikarin carcaran seredana iyadeya Therapiya derûnî bikin, wekî din roja xwe bi normalî bi ser ve bibin. Di vê rewşê de yê nexweş dikare here nexweşxaneyeye biroj û tedawî bibe,



lê êvaran û dawiya hefteyê li malê derbas bike. Yê ku li nexweşxanê bimîne, pêdiviyê netenê ew yê têkildar nexweşê derûnê be, belê laşê wî jî biêşe û nikaribe ji ber êşên xwe yê zor û êşdar rojên xwe baş bi ser ve bibe û kar bike. Ew şêwe ji nexweşan pêdivî ye li nexweşxaneyê dermankirin û tedawîkirina derûnî û xemankiyê. Ew divê li nexweşxaneyê xew bikim û li wir guhdan bi wan bête kirinê.

Dermankirina bi dermanan

Di hinek pergalan de, dikare pêdivî be, ku Therapî jî bi dermanan bibe, bo nimûne bo vê hindê, ji bo kêmkirin û daxistina tirsê û çalakiya zêdeyî sinor û ji bo çareserkirinê hinek symptom û nîşanên din diyar bibin. Ev rewş dikare bibe temam ji bo terapiya derûnî an jî, ku ew terapiya ku bikar têt, encamên baş û çavêkirî bidest nexe. Wek rêyekê ku cihê Therapiyê bigire derman qet nabe çareserî. Gelekî giring e, ku hun li dûv şîretên bijîjk û nojdar ên xwe biçin û ji ber xwe derman kêm û zêde nekin!

Rêvebirin û armanc ên Therapiyê

Therapî dikare yeke ye, taqekesane an jî wek kom bête kirinê. Mîna li jor hatibû nivîsîn, konseptên Therapiyê dikarin zor daran bi „gelek şeweyan“ bêne kirinê, tê wateya, ku bijîjk an jî tedawîker rêbaz û metodên zanistî, pisporî yê n cuda bikartînin, daku bibaştirin şewê bikaribin alîkariyê pêşkêş bikin.

Hijmarek mezin ji mirovên bi Trauma“ Xemnakî“, dijîn, jiyana xwe ya xemnakî weha hesêb dikan, ku „Jiyaneke rawestiyayî“,ye. Ji wê jiyana zor bitirs in, û metirsî li nik wan peyda dibe, ku ew nema dikarin jiyaneke xweş biser ve bibin. Therapiyeke derûnî dibe alîkar, ku ew rewş baştir bibe, baweriya bi xwe vegeirîne, gav bi gav bikaribe vegeer mîna berê û roj û jiyana xwe bi ser ve bibe.

Negirêdayî bi wê ve, şeweyê Therapiya bi kar bihêt, ew armanc ên her dem herî giring in:

- Kêmkirina êrîşan
- Bêhîntengî an jî nehêminiyeke zor tund/ qeher û têkçûnên xewê kêmkirin
- Hestê tehdîdên lezgin kêmkirin
- Bêcîrî hilînin, kar li ser astengên hilana Traumayê bête kirinê (kêmkirina ji reva ji ber kêşeyan)

Gelek rêçêkên therapiyê hene û li gorana rêveçûna therapiyê, zorbeyî caran ji 1 salê ta 2 salan berdewam dikan. Di dema Therapî lidar e, divê cihekî hêmin, tenahî û aram bête dîtin, daku bo yê têkildar baweriyeke yekcar bibîne û rê bi yê tedawîker bo danûstandin bête dan. Du tiştên giring di rêveçûna therapiya derûnî de hene, herdem rêzgirineke dualî û baweriyeke yekcar zor, daku têkiliyeke karkirinê gelekî baş û mukum bikaribe ava bibe. Zêdebarî wê jî, li ser tedawîkerê derûnî pêwîst e, agahiyan nepenî bihêle! Ev karê nederxistina agahiya û nepeniya wan erkê wergervan jî, yê rola pira zimantêgehiştinê dilîze û wek kesê sisiyan têtê qadê (hun dikarin, agahiyan di çarçewa bi „wergervanan“ re bibînin di rûpela 20 de.

➔ Istîqrar û perwedeya derûnî

Merc û şertê herî giring bo serkeftina tedawiya nexweşiya Libinguhêhevketina li dûv Traumayê re ev e, ku kesê pêketî xwe di tenahî de bibîne û ne di tirsê de, ku ew wan serpêhatiyên bi derd û trauma dubare nebîne û neji. Giring e, ku yê nexweş di dema Therapiyê de hest bi aramî û tenahiyê bike.

Yê tedawîker ew yê yekem e, ku digel yê nexweş, li ser nîşan û Symptomên bihêz û çavliêremayîna vê therapiyê û hêviyên pê ve girêdayî dipeyive. Di çarçeweya perwerdeya derûnî, dê ji nexweş rebête ravekirin, bo çî ew î ev Symptome yê hene, û çawa ev têkçûn, bi alîkariya tedawîkirinê dikarin kêmkirin an jî bi yekcar nemînin, Yê tedawîker, dê li ser hindêk cir(silûk) û şewefîkarê yê n destnîşankirî, bo nimûne ku pêdivî yê xwe dûrî hin cihan bike an jî hinek fîkaran binbin bike, daku bikare zora Traumayê bibe, van wek hinek rêbaz û mekanîzmên xweparastinê bikar

bîne, wê baş be, lê diyar e ji bo karkirina li ser Traumayê ew mekanîzîman dikarin bi şêweyekî pozîtîv kartêkirinê li rêveçûna terapiyê bikin û guherînên berçav diyar bikin û li ser bikariibe bête karhatin. Ev başbûn û îstîqrara yê nexweş li gorana wê hindê ye, rewşa yê nexweş çawa ye, kêma an jî zêde pêdiviya yê nexweş demeke dirêj ji bo tedawîkirinê bibe.

➔ Liserkarkirina Traumayê di rêya

Therapiyê re

Kengî yê nexweş hestkir, ku xwe li devereke (ew cihê dibû sedema hingavtina Trauma, nema wî xemnak dike), tenha û aram û îstîqrar, dikare watedar be, pêk ve digel tedawîker li ser babeta Trauma yê û derdan biaxive. Ew e gelekî girîng e jî ku bizanibin, ku mirov nemeçbûr e li ser rûdanan biaxive, eger nexwaze, eger naxwaze biaxive, lê biaxive, an jî meçbûr bibe, dê hinga gelekî zerarmend bibe, ku êdî dubare bizivire wê rewşa wan rûdanên, ku bûn sedema nexweşiya wî. Mebest ji we axaftinê dermakirina yê nexweş e, ku bizanebûn, ew birahtinên wê rûdana bûyî sedema nexweşiya wî, bike parçeyek ji jiyana xwe û di rêka behskirina wan re (Narration) bikariibe, sud were wergirtin. Di rêka behsêkirin û vejandina bizanebûnê li wan rûdanan, hestên metirsiyê kêmtir dibin. Hestên tadelêkirina wan

rûdanan û wek wê jî tirs, di rêveçûna terapiyê de, dibe mijûlbûna bi Trauma ve. Aya, ev axaftina li ser derd û kul û kovanan (Trauma) mumkin, an jî bisûd be, bi çend faktor ên cuda cuda hene, bend e (ji wan granî û kûrahiya traumayê ye) û ew êdî yê nexweş û tedawîker, di nav hev de behsê dikin. Ji ber ku her mirovek ji yê din cuda ye, lew ra jî terapiya derûnî, ji mirovekî bo yê din cuda ye û bi kesayetiya wî ve ye.

Di terapiyê de, têknîkên din jî tene fêrîkirinê, yên ku dikarin serederiyê di gel Nişan û Symptom ên Trauma sanahî bikin. Bi tedawîkirina cirane "Silûkî" re, bo nimûne yê nexweş carnan „Erkên malê“ ji yê/a tedawîker werdigire û wan wezîfeyan, bi xwe re dibe malê. Pêdiviyê li malê, ew teknîk û pêşniyarên hatî kirinê bikar bîne û nêrîna xwe li ser bide, k ata bi çi radeyê nişanên nexweşiyê kêma bûne û gyanê wî çendî bi rehetiyê hest dike. Encam û hest ên ku di pêkanîna erkan de peyda bûne, pêdiviyê di rûniştina din re, di gel tedawîkerê derûnî bêtebehsêkirinê.

Her dem pêdiviyê, tiştê bi te re çêdibe an jî dixwazî, ji tedawîkerê xwe re bibêjî, ew tiştên ku di rêbaza tedawiyê de jî, ne bi dilê te ye, an jî hertîştêkî tu naxwazî li ser danûstendinê bikî, bibêje.

EMDR

Dema metirsî weha zal û serdestî yê nexweş be, ku di cihêcîh de, destpêkirina terapiyê nemumkin e, dîsan jî rêgayêke din heye, ku yê tedawîkerê derûnî bikar bîne, ew jî teknîkeke, ku navê wê EMDR e. Di rêya çavlivandinî bîlez re, ku di bin çavdêriya tedawîker de, eger sist bibe wek ku neyê kontrolkirinê û hestên rûdanan ku ber çavan re diçin. Di rêveçûna terapiya ji wê û wêdetir de jî ev rêbaz dikare bête bikaranîn.

➔ **Amadekirina Jiyane di pey Therapiyê re**

